Deynkirina alavên alîkar

Te alaveka alîkar yan zêdetir ji Hjälpmedelscentralen deyn kiriye. Di mideta deynkirinê de, tu ji sexbêrîkirin û paqijkirina berdewam berpirsyar î. Alava alîkar tiştekê deynkirî yê şexsî ye û çênabe teslîmî kesekê din bê kirin. Nesexbêrîkirina alava alîkar dikare bibe sebeb ku divê tu wê vegerînî û di hin halan de mecbûr bibî bedela wê bidî. Çênabe ku tu eyarkirinên sabit yên alava alîkar biguhorî yan terkîban lê zêde bikî. Heger tu alava alîkar bi awayekê din - ji bilî ya ku agahdarî derbarê wê ji te re hatine dan - bi kar bînî, tu yan welîyê te berpirsyar dibe heger tiştek biqewime.

Alava alîkar dê bê vegerandin gava hewcedarî nemîne, dema peymanê xelas bibe yan deynker ji vê parêzgehê/wîlayetê bar bike. Divê alavên alîkar yên xerabbûyî û kevn jî bên vegerandin.

Gava tu alavên alîkar êdî bi kar neyînî, divê tu wan baş paqij bikî û vegerînî cihên han:

Hjälpmedelscentralen, Fraktgatan 5 Eskilstuna.
Hjälpmedelsfilialen Katrineholm, Kullbergska sjukhuset, Entré 2.

Hjälpmedelsfilialen Nyköping, Spelhagsvägen 13
Navenda tendirustîyê [vårdcentral] ya herî nêzîk yan beşê veguncandinê [rehabenhet] yê belediyeyê.

Heger pirsine te hebin yan xizmetê bixwazî têkilîyê bi hjälpmedelscentralen [hjälpmedelscentralen} 0771-405 406 re bike.

navnîşan Hjälpmedelscentralen, Fraktgatan 5, 633 46 Eskilstuna *serdan* Fraktgatan 5, Eskilstuna
telefon 0771-405 406 *faks* 016-51 47 76 *e-poste* kundtjanst.hmc@dll.se